# “Li dijî qirkirina jin bibe dengê xweparastinê”

Pêngava Enternasyonal ji Tevgera Azadiya Jinên Êzidî (TAJÊ)

Di 8 Adarê 2024 an de, me Tevgera Azadiya Jinên Êzidî (TAJÊ) pêngava **“Li dijî qirkirina jin bibe dengê xweparastinê”** despê kir. Ji roja jinên cîhanî heta 03.08.2024 an, salvegera 10. ya fermanê li Şengalê, em dengê xwe li dijî qirkirina jin û ji bo xweparastinê bilind bikin. Em ji bo hamû jinên cihanê bang dikin ku beşdarî vê pêngavê bibin.

Em hêvî dikin ku hûn bi rêbazên dewlemend tevlî vê pêngavê bibin. Ji bo pêşxistin û bi hêzkirina kampanya, her kesê bixwaze dikare insiyatîf bi kar bîne. Her wiha wek TAJÊ, em dixwazin bernamê ji we re pêşniyr bikin. Em hêvî dikin ku hûn bi reng û candên xwe tevlî bibin.

## BERNAMA:

• Hûn dikarin heta 03.08. beşdarî pêngavê bibin, mînak bi dîmen, nîvîs yan hwd.

• Heta 01.07: **Dengên me rengî ne!**
Stran, helbest, wêne hwd – tiştek hunerî – bi ziman û rengên dewlemend li ser wateya xweparastinê li dijî qirkirina jin hûn dikarin ji TAJÊ re bişînin. Di dawiya pêngavê de, em dixwazin hemû tiştê hunerî di biroşûrekê de biweşînin.

• Heta 15.05: **Bi dirûşma YJŞ rûmeta me ye!**
Piştî fermana 03.08.2014 an Yekîniyên Jinên Şingal hat ava kirin, heya niha wek hêzek fermî nehatiye qebûl kirin. Her wiha dawleta Tirk bi balafirên xwe êrîşî YJŞ ê dike. Ji ber vê, gelek şerwanên me şehîd ketin û gelek birîndar bûn. Em dengê xwe ji bo xweparastinê bilind bikin û piştgiriya xwe bi YJŞ re nîşan bidin. Ji ber vê, em banq dikin wêneya bi ala YJŞ ê ji emaila TAJÊ re bişînin.

• 01.04. heta 01.06.: **Şehîdên me her dem ronahî û hêviya me ne!**
Di biharê de xwezaya Şingalê reng rengî dibe. Taybet li çiya, gûlên herî xweşik vedibin. Ji ber vê, em dixwazin di biharê bîranîna jinên ku li dijî şideta baviksalarî tekoşîn kirine û li berxwedane bê çêkirin. Em bang dikin, ku hûn jî li cihên xwe di meha 4 û 5 de bîranîna çêbikin. Ji bo vê, em ê li ser malpera TAJÊ sûretên jinên Êzidî yên ku di dîrokê de li berxwedane biweşînin.

• 03.08: **Salvegera 10. ya fermanê li Şengalê**
Ji bo dema pêş carekî din jenosîd û femîsîd dijî jinan, civakan yan baweriyan pêk neyê. Em bang dikin li her devera cîhanê, hamû jinên cihanê ku çalakiyan li dar bixin. Emê di vê rojê de, dengê jinan li dijî qirkirina jin û ji bo xweparastinê gelek bilind bikin.

Her wiha em wek TAJÊ semîner, sipot û kombûnan amade bikin. Dama zedertîr agahî li ser ev bernama heye, em ê biweşînin.

## GERING E:

Ji bo her kes bikaribe vê pêngavê bişopîne, girînge hûn suret yan dîmenan ji hemû çalakiyan ji emaila TAJÊ re (tajesengal.2016@gmail.com) bişînin. Her wiha emê li ser malpera TAJÊ (www.taje-shengal.com) agahiyan bidin. Ji bo social medya emê **#AgainstFemicide** û **#DengeXweparastin** bi kar binin.

Werin em bi hev re, bi rûhê JIN JIYAN AZADÎ dengê xwe bikin yek!

Silav û rêz

Şengal, Adar 2024
**Tevgera Azadiya Jinên Êzidî (TAJÊ)**